

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
* **Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 130)* *Sal 22* *Gulan 2017 z - 2629 k* *Buha (75)L.S*


# Efrîn Berdêla Kurdeweriyê Dide

**Desteya sernivîser**



Ji destpêka qeyrana Sûryê de, hemî nevçeyên kurdî û bi taybetî navça Efrînê di tengahî, dorpêçkirin û keftlefteke giran de ye bi çekdarên tundrew re. Eger carina hêrs û hêrişên wan radiwestin, nijadperestiya dewleta Tirk dest pê dike û ew jî kîna xwe bi ser gelê kurd de dirijîne. Li navça Efrînê, ta roja îro piraniya gundên li ber sînorê Tirkiyê û sînordarên ketîbeyên çekdar li Başûr û Rojhilata navçê, bi dehên caran tûşî hêrişên çekdar û bombebarana wan bûn. Di encamê de bi dehan mirovên me yên sivîl jiyana xwe ji dest dane, bi sedan birîndar bûne, û ziyanên mezin gihîştine arzûyên welatiyên me. Kîneke mezin li ser tevaya navçeyên kurdî, bi taybetî jî li ser navça Efrînê peyda bûye û çavsoriya dijatiyeke kufkî serî hildaye. Sedem û têvedêr jî dewleta tirkiyê ye. Ew çekdarên ku pê ve girêdayî û bi pereyên wê ….. ❷

## Li Îranê Hilbijartina Serokmar



Li roja 19ê meha Gulanê helbijartin ji bo serkomariya Komara Îrana Îsalamî çêbûn. Li gora encamên fermî, serokomarê berê rêzdar Hesen Rûhanî rêjeya 57% ji dengan bi dest xist, bi serket û ji bo çar salên din hat hilbijartin. Çavkanî û nêrevanên ku rewşa Îranê dişopînin, Hesen Rûhanî wek nûnerê şepola çaksazkirinê dinirxînin. Lê mîna ku xuya dibe gotina çaksazkirinê bi taybet Îranê xwedî wateyekî têvel û rêjeyî ye, li gora …………….. ❹

## Buhabûn ... Sedem û Çare!?



Tu kîjan mirovî dibînî, li kûderê rûdinî, diçî kîjan malê, devê kîjan karker û cotkarî vedikî, gotin û şor tim ew e: Buhabûn.. buhabûn..!! Her kesek ji ber buhabûnê dinale, dibase û bi agirê wê dişewite, lê li dawiyê neçar dibe, li ciyê xwe rûdine û jiyana xwe, zaro û mala xwe li gora rewşê durust û dûzan dike! ……………... ❺

# Rijîma Turkiyê dîn dibe ... û Metirsî li ser herêmên kurdî zêde dibe

**Memê Alan**

Piştî seredana serokê Turkiyê birêz Receb Teyêb Erdoxan ji Emerîka re, Turkiyê her çû zêdetir har û dîn bû. Çimkî, seredana wî bi hemî pîvanan bi ser neket û hêvî û armancên wî ji seredanê têk çûn. Ji ber ku, doseya radestkirina Fethela Gulen – ku ji zû ve li Emerîka dijî- bo Turkiyê re hate nakirin. Beşdariya Turkiyê û hevalbendên wê ji girûpên çekdar ên islamî di rizgarkirina Reqê de ji Rêxistina Dewleta Islamî ( Da`işê) hat nakirin. Ji daxwaza Turkiyê ji bo bêçekirina Hêzên Sûriya Demokrat re jî nehate erêkirin.Vêca, Erdoxan poşman û destvalal ji Waşntonê vegerî. Loma jî wek kirîzê bi wî û rijîma



wî re çêbû, har û dîn bûn, siyaseta wan her çû ji dûzan ket û nema zane çi bike? Bi taybetî jî piştî ku serokê Emerîka birêz Donald Tiremp biryar ji bo biçekirina hêzên QSDê- bi çekên curbecur- da û yekser jî dest pê kir. Ji ber wê tu çare li pêşiyê nema, ji bilî ku hêzên xwe yên çekdar bi aliyê Girê Sipî û Efrînê ve rêke û li wir bi cî bike. Herwiha, guman heye ku nîşana kesk jî dabe hevalbendên xwe ji çekdarên sûrî ku di bin destê wê dene, da ku pê gef û guran bide




Rêvebiriya Xweser û gelê Kurd, metirsiyê bixe dilê wî, ji viyan û hêviyan bêxe û asa û hêminiya herêmên Kurdî bileqîne. Belkî ne tenê weha, dibe ku wan yekser armanc bike û bêşîne jî. Ne tiştekî bêgane ye ku di rojên pêş de bûyer û hêrişên weha kambax bi destên wan xiniz têroran berdewam û dubare bibin. Vêca,li hember vê metirsiya ku heye, yekîtiya gelê Kurd, destekirina hêza xwe ya berxwedêr (Y.P.G û Y.P.J) û hişyariyeke bêtir gerek e.

---

**Efrîn Berdêla ... Dûmahîk**

kar dikin bi ser Kurdan de germ dikin û kêra wan tûj dikin. Lê mirov û xelkê me li ser axa xwe pêdar e, pê ve perçîm bûye, herdem amade ye ku ji ber rûmet, xak û heyîna xwe ve bergiriyê bike. di va dema teng û mofirkî de, pêdarî, girêdana bi xakê ve û berxwedan û bergirî ji gelê kurd re bûye qeder û rev jê nemaye. Erê lihevnekirina tevger û partiyên me dilê mirovê kurd dêşînin û lome û gazinên mezin jî dike, lê dil û destên wî di warê xebat û xweparastinê de sar nabin.

Li roja 19ê Gulanê navça Efrînê tûşî hêreşeke têrorîst bû û di encamê de du berxwedêrên Kurd jiyana xwe ji dest da û heft jî birîndar bûn. Sekretêrê Partiya Yekeîtî Ya Domokrat a Kurd li Sûryê berêz Mihyedîn Şêx Alî li gel hejmarek ji serkirde û hevalên partiyê di rêwresma veşartina pakrewanan de beşdar bû. Bona wê bûyera têrorîstane, rêxistina Efrînê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê gotinek belavkir, tê de wiha got:

Li berbanga roja Înê 19/5/2017an, komek ji têrorên Eniya El Nusra û komên pê ve girêdayî gundê Îska- li Başûrê Efrînê bi 20km- dan ber hêrişeke xinan û bombebaranê. Û piştî çend katan di pevçûna di navbera hêrişkeran û Yekîneyên Parastina Gel û Jinê, hêriş hate têkbirin, heft çekdarên kurd birîndar bûn û diduyan jî jiyana xwe ji dest dan. Pakrewan ev bûn: Sîwar Mistefa Xelîl ji gundê Xezîwê û Xalid Mihemed Eloko ji gundê Îska.

Em di Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd de van tûş û hêrişên çepel ji hêla komên têrorî û gawirkirinî ku ji dewleta Tirkiyê de têvedayî ne, li ser sînor û gundên navça me bi tundî şermezar dikin. Armanca wan ew e, ku aramî û hêminiya navça me têk bibin. Banga me ji gelê me re, em li pêlanên dijmin haydar bin û destên xwe bidin ypg û ypj. Banga me ji civaka navnetewî re jî ku li kêleka gelê me bisekine û ji têror û nûkeran biparêze.

Rûreşî û şermezarî ji têrorên kujer re. Nemirî û serbilindî ji pakrewan re. çakbûn ji birîndaran re .

# Ne ji sekreterê giştî yê Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê rêzdar Mehyedîn Şêx Alî bûya, li Rojavayê Kurdistanê alozî kûrtir dibûn û divê mirov rastiyan bibêje.

**Hozan Efrînî ***





Ew kesên ku xwe di partiyên paskoyî de bi serkirde, sekreter û serok dizanin, yên ku êrişî kesayetiya rêzdar Şêx Allî dikin, dixwazin wî biçûk nîşan bidin û wî bikin kesekî nepejrandî, ez piraniya wan nas dikim û bila ti kes xwe di ava zemzemê de nîşan nede, weko bêjin ku ew bi ava zemzemê hatine şoştin, pak û temîz in û ji bilî wan jî tev peya, ajan û neyarên doza kurd in. Bawer bikin ti kes ji wan wek çarîkek xebata kurdperweriya rêdar Şêx Allî nekirine û wê nekin jî.

Ez ne berevaniyê ji ber kesayetiya Şêx Allî dikim, û ne jî pêwîstiya wî bi min heye, ji ber ku bi hezaran kesên alîgir û endamên partiya wî hene ku berevaniyê lê bikin û di rastiyê de jî, ew jî pêwîst nakin, ji ber ku xebat û helwesta rêzdar Şêx Allî bi xwe dikare berevaniyê li kesayetiya wî rêzdarî bike.

Ez ji kevin de xebat û karê Şêx Alî dişopîn im, min car hebû rexne jî dikir û car hebû spas jî dikir. Ji ber ku ew kesê bilive û bixebite, wê rastî kêmasî, şaştî û çewtiyan jî were. Wek Lînîn digot: Ew kesên ku kêmasiya nakin hîn ji dayîk nebûne. Ji ber ku dema mirov kar dike, wê şaştiyan jî bike û ev kar tiştekî pir normal e.

Ev serkirde ji ew kesên ku xwe kirine serkirde an jî xwe bi ser alîgirên partiyên xwe sepandine û bi darê zorê an jî dolaran xelkê li xwe kom dikin, gelek cuda ye.

Ev êrişa ku li dijî Şêx Alî bi rê ve diçe, ne normal e û cihê nîgeraniyê ye.

Ev ne cara yekê ye ku hinek Alî weha dikin û ew dizanin çi dikin û wê çi bikin.

Ez herdem gotina xwe derbarê rola rêzdar Şêx Allî tîn im ser nivîs û ser ziman ku:" Ev Serkirdeya Xwedî Girîngiyeke Taybet e, ew Parêzvanê Aştiya Navxweyî Li Efrîn Û Rojavayê Kurditanê Ye ."

Bi nêrîna min ku ev kes, li cihê ku were biçûkirin û teşhîr bi derheqê kesayetiya wî bê kirin, pêwîst e were parastin, xwedî lê derketin, mezinkirin û rêzlêgirtin. Ji ber ku kesayetiyên mîna rêzdar Şêx Allî, ji bo şoreşa me gelek girîng û pêwîst in. Ew xwedî roleke aştîparêz e û hevrêziya nîştimanî û ya kurdî diparêze.

Ev kes xwedî roleke pir mezin û giranbuha ye û xwedî projeya yekrêziya netewî ye, ne tenê li Rojavayê Kurdistanê lê ew li hemû aliyên Kuridstanê û nimûneya herî li ber çavan ew bû ku di sala 2014`an de dest bi gerek e hevdîtinên cur bi cur kir û tê de, ligel hemû aliyên nakokdar civiya û nêrîna xwe û partiya xwe arasteya wan aliyan kir taku hewil bide ku tevahiya aliyan ji hevdu nêzîk bike, yekrêziyê biparêze û destkevtên netewî biparêze.

Ez dixwaz im van pirsyarên ku di serê min de hene ji tevahiya partî û serkirdeyên wan yek bi yek bikim; Gelo kî ji we nasnameya rêjîmê ne pê re ye?.

Gelo kî ji we di dibistanên rêjîmê de nexwendî ye?.

Gelo kî ji we bi peyayên rêjîmê re peywendî nekiriye?.

Gelo kî ji we di raperîna 12 adarê de bi Mihemed Mansora û Elî Memlok re neciviya?.

Gelo kî ji we zarokên xwe di fermangeh, dibistan û zanîngehên rêjîmê de tunene?.

Êdî bes e ji propagandeyên we ên pûç re. Hûn bi riya .... 4

# Li Îranê Hilbijartina Serokmar

Li roja 19ê meha Gulanê helbijartin ji bo serkomariya Komara Îrana Îsalamî çêbûn. Li gora encamên fermî, serokomarê berê rêzdar Hesen Rûhanî rêjeya 57% ji dengan bi dest xist, bi serket û ji bo çar salên din hat hilbijartin. Çavkanî û nêrevanên ku rewşa Îranê dişopînin, Hesen Rûhanî wek nûnerê şepola çaksazkirinê dinirxînin. Lê mîna ku xuya dibe gotina çaksazkirinê bi taybet Îranê xwedî wateyekî têvel û rêjeyî ye, li gora helwestên rêçparêzên olperest tê pîvan, ne li gora pîvanên azadane û demokratîk. çinkî li Komara Îrana Îslamî, destlatdariya rastîn ne destê serokomar, şalyar yan perlemanê de ye-. Sîstema (Welî El Feqîh û Ayetûllahan)) destlatadara rastîn e. Yanê eger guhertin di wê sîstemê de çênebe û sazûmaneke demokratîk e hemdemî netê peyda nebe, rewş li Îranê netên guhertin, û tu çaksazî pêşketin ne bi destê Rûhanî û ne yên bilî wî ne gengaz in.

Îran welatekî mezin e. Ji gelek herêmên xaknîgarî û dîrokî yên curbecur pêk tê. Gelê wê ji gelek netew, ziman, ol, bineol û şaristanî pêk tê. Lê di rewşa wê ya siyasî û destlatî ya niha de, ango sîstema (wîlayet El Feqîh), tenê pêbendên bineola Şî`î destlatdar in. Gelê Faris jî, digel ku tenê %40 ji welatiyên Îranê ye, destlatdarî di destê wî de ye û gelên din jî mîna Kurd, Ereb, Bilûş, Azerî û hwd, ji hemî mafên xwe yên netewî, siyasî, demokratiî û hwd bêpar mane. Loma jî baweriya wan bi hilbijartinan nabe û tu hêviyên guhertin û çaksazkirinê tê de nabînin.

Li derbarê babeta hilbijartina serokomariyê, sekreterê Partî Demokratî Kurdistan -Îran rêzdar Mistefa Hicrî diyar kir, ku partiyên Rojhilatê Kurdistanê li ser mijara boykotkirina gel a hilbijartinan hevdeng in û got: “Gelê Kurdistanê gihiştiye wê baweriyê ku sozên Komara Îslamî ya Îranê ne cihê baweriyê ne û eşkere ye, di van hilbijartinan de ji kurdan re ti tişt nîne”. “Lê rejîma Îranê şanoyekê



pêşkeş dike da ku ji cîhanê re bêje ew rejîmekî demokrat e. wekî ku nase, berbijêrên vê xula hilbijartinê ew kes in, ku di 40 salên dawiyê de rola wan di nexweşiyên Îranê de hebûye, û herdem bi ser gelê kurd de hatine… Namzetên serokomariyê jî ne namzetên gel in, ew ji aliyê rejîmê ve hatine hilbijartin û ji gel jî dixwazin deng bidin wan… loma jî namzetên serokomariyê nikarin behsa tiştekî bikin. Li Îranê tu desthilatekî serokomaran jî nîne, ji ber ku desthilat hemû di destê rêberên olî de ye”.

---

**Ne ji sekreterê … Dûmahîk**

çewtiyê de diçin û we her kesên ku ne bi we re ne, ji xwe re kirine neyar û dijber. Ev kar wê we biçûk bike û hûnê li paş bimînin, ew kar û helwesta we, wê ziyanê bighêje we û pirsa netewî kurd û wê ji bo dîrokê bête nivîsandin.

Ez wek dibhîsim û li ser rûpelên vegihîştina civakî û ger rêzdar Şêx Allî ne ji Efrînê ba, ew êriş li dijî nabe, û eger ne alîgirê Xweseriya Demokratîk û endamê Meclîsa Demokratîk a Sûrî bûya, ev êriş û neyartî bi yekcarî li dijî kesayetiya wî rêzdarî nedihate kirin. Li vir mirov pir maliq dimîne ji van kesan re. Gelo eger kesek ne li gel te be, tu wî bi dijberî dizanî?.

Gelo kesekî ne bi ramanê te re be tu wî bi neyar dizanî?

Tikaya min vê helwest û nêzîktiyan berdin, bila gelê me hinekî ji xwe re vehese û serê xwe hêmin bike.

Mixabin! Ez di dawiya nivîsa xwe de, wiha dibêjim, eger ne ji rêzdar Şêx Allî bûya, wê li Rojavayê Kurdistanê, rewşa navxweyî aloztir bibûya. Ew kesek e ji kesayetiyên bi hêminkirin û aramkirina peywendiyên ber bi parastina aştiya navxweyî ye. Pêwîst e em hemû li derdora kesayetiyên wiha kom bin û rêzlê bigrin û biparêz in.

* PUKmedia Silêmaniyê - 28-5-2017

# Buhabûn ... Sedem û Çare !?

Tu kîjan mirovî dibînî, li kûderê rûdinî, diçî kîjan malê, devê kîjan karker û cotkarî vedikî, gotin û şor tim ew e: Buhabûn.. buhabûn..!! Her kesek ji ber buhabûnê dinale, dibase û bi agirê wê dişewite, lê li dawiyê neçar dibe, li ciyê xwe rûdine û jiyana xwe, zaro û mala xwe li gora rewşê durust û dûzan dike!

Li Sûryê di van rewşên me de, hemî tiştek serûbinî hev bûne. Wek nimûne, ji aliyê jiyana rojane de, welatiyên sade û kebaniya malê nizanin tişt û kelûpel ji kûderê tên, çawa digihên bazarê, çima buha yan erzan dibin. Ew li her derekê tenê tiştekî dibihîsin: (Dolar buha bûye.. Dolar rabûye..). Gengaz jî heye, ku gelek kes nizanin (Dolar) jî çi ye.

Piştî şeş salan ji şer û wêrankirina jiyana mirov, civak û aboriya Sûriyê, nirxa Lêra sûrî li hember Dolarê Emerîkî û pereyên din jî bêtirî dehcarkî daketiye. Ew yeka jî bandoreke mezin li ser buhabûn, kirîn û firotina kelûpelên têkber dike û jiyana rojane dijwartir dike.

Zincîra gihîştina tişt û pêdviyên têkber(musthlek) ên mal- ta digihê destê welatiyan- di rewşên normal de wiha ye: Berhemdar > bazirganê sereke> bazirganê biçûk (firoşxane)> têkbir(mustehlêk). Di rewşên asa û normal de, ta berhem ji ba berhemdêr digihê destê têkber, di bin du destên din re derbas dibe, ew her du dest jî kara xwe dikin ser nirxa berhem û mewdanê, û bi wê yekê nirxa kelûpelê bilindtir dibe.



Nirxa navbênkariya bazirgên û buhaya kelûpelan, ew di rewşên normal de, li gora zagonên taybet û lêkolînên pîvayî tên danîn û rêjeya kara her mofirk û canbazekî tê nasîn. Yan jî dewlet bi xwe bi rola bazirgên radibe, destê xwe datîne ser bazara hin kelûpel û pêdviyên welatiyan û nirx û buhaya wan li gora dahatiyên malbatê datîne.

Di rewşên me yên îro de, ew mofirkên di navbera berhemdêr û welatî de ketine nav tevliheviyê û çavdêrî li ser nemaye yan jî pir lawaz bûye. Li gelek deveran destlata dewleta navendî nikane pirsa nirx û buhaya berheman bişopîne, ne jî destlatên herêmî kanin wê pirsê bi rengekî biserketî li destê xwe bigerînin û kontirol bikin. Li bervajî wê, li gelek deveran, destlatên herêmî hîn firkek li rêzezincîra (berhem … têbkbir) zêde kirine û gumrikê li ser her kelûpelekê danîne û diqedînin. Ji xwe bazirgan jî pereyên wê gumrikê dike ser buhaya kelûpelan, tiştan buha dike û difroşe. Ango ew perena ji tûrikê wî narin, ji berîka welatî derdikevin û êş û gazinên wî girantir dibin.

Bi rastî, pirsa buhabûnê li Sûryê, nemaze li herêmên ku li derveyî destlatdariya dewleta navendî ne, pirseke pir têkilhev, lihevketî û dijwar e. Ew roj ji rojê aloztir dibe, û pir zor e ku di van rewşên awarte û qurs de were dûzankirin û durustkirin. Ji xwe ne rast e jî ku-mîna hinek hêvî dikin- ev pirsa giring ku bi jiyana welatiyan ve girêdayî, bi dilxwaziyên bikaranîna xû, sincî û wicdanê pak ên bazirgan û bazarê ve were girêdan û bi cih were. Lê belê netê wê wateyê jî ku ew pirsa giring û bi jiyana mirov ve girêdayî, wiha bê xwedî û serberdayî, kes lê nepirse û bêçare bimîne.

Di rewşên mîna van rewşên me de, gengazî heye ku destlatên herêmî karibin çend tiştan ji bo çareserkirna pirsgirêka buhaya kelûpelan de bikin. Yek jê: Gumrik û baca li ser kelûpelan ku derbas herêmê dibin kêm bike yan jî tewir rake. Didu: Nêrevaniyeke baş li ser bazirganên bazarê û firoşxanên biçûk bike. Sisê: Sarexanan(berrad) ava bike, kelûpelên xwarinê ji derveyî navçê bikire û bi buhane guncav di firoşxaneyên taybet de bifroşe.

Kar, xebat, avakirin û şerûceng jî ji bo xweşkirin û hêsankirina jiyana mirov in. Welat bi mirov dibe welat û şên, xweşik û navdar dibe. Mirov kane ta radeyekê xwe li ber dijwariyan ragire, lê paşê diweste, neçar dibe û xwe radestî qederê dike, nemaze eger kêr gihîşt hestî.



# Erebê Şemo, Bavê Romana Kurdî



Şemoyê Şamil, kurdekî ji hoza hesenî ye. Li navça Sûrmelî, li devera Qersê ku bi ser Ermenistanê de bû dijiya. Şemo kurdekî pir perîşan bû, li ba xwenedanên Ermen û Yûnanî şivantî dikir. Wî zarokên xwe di perîşanî û sêfîltiyeke pir giran de mezin kirin. Piştî jina wî ya yekem mir, ji jina wî ya duyem Ereb biçûkê du kur û sê keçikan bû. Şemo û jina xwe zarokên xwe di rewşeke pir xirab, di binê axuran û di nav kayê de mezin kirin. Ereb li sala 1897an ji dayîk bûye. Wî bi çûkanî û ta xortaniya xwe karên herî dijwar dikirin û di jiyanek pir dijwar de mezin bû. Gava bû gênc şoreşa Bulşefîkan rabû û ew jî tevlî refên wê bû, tê de kar û xebateke çalak kir û ta dawiya jiyana xwe jê re dilsoz bû.

Piştî ku şoreşa Bulşefîkan bi ser ket û dewleta Sovyetistan hate avakirin, Ereb dest bi xwendinê kir û li sala 1924an ji amojgeha Lazarêf a Zimanan derçû. Wî bi zimanên kurdî, rûsî, ermenî, yûnanî, tirkî, almanî, azerî, Gurcî jî zanî. Ew demekê bû serokê amojgeha kurdî ya perwerdekirina mamostan. Li sala 1930î yek ji damezrênerê rojnama “Riya Tez” bû û ta sala 1937an rêvebirê wê bû. Li sala 1931ê bû endamê komîta navendî ya Partiya Komonîsta Ermenî. Lê li sala 1937an Cûzêf Stalîn ew dûrewarî Sîbîriya kir û nozde salan li wir ma.

Ji dahênê wî: Şivanê Kurd- roman 1930. Jiyana şadewer- roman 1966. Nasikê Sexte- Şano 1930. Berbang- Roman 1958. Dumdim- Roman 1966. Pirsa Derebegîtiyê li nav kurdan- lêkolîn 1934. Pirtûkên Ereb Şemo bo gelek zimanan hatine wergerandin. Ji romanên wî ya navdartir û wek dayîka romangeriya kurdî tê dîtin “Şivanê Kurd” e. Ereb di romana xwe de, jiyan û serboriyên xwe ji dema zaroktiya xwe de û ta hilperîna şoreşa Oktoberê bi zimanê xwe yê kurdî û bi şêweyekî hunerî î xweşik tomar dike. Pişt re ew hatiye wergerandin zimanê rûsî û li sala 1935an li bajarê Teflîsê çap bûye. Paşê zaniyar û kurdnasê rûsî ê navdar Basîl Nîkîtîn ew wergerandiye zimanê firensî. Dûv re nemir Nûrdîn Zaza jî, ew bi zimanekî zelal û xweşik ji firensî kiriye kurdî û çap bûye. Bi rastî romana “Şivanê Kurd” ya Ereb Şemo, taca serê roman û nivîsên kurdî ye.

Kurdê nemir Ereb Şemo li 21ê Gulana 1978an temenê xwe kir û çû ser qedera xwe. Zor pêwîst e ku roja goçkirina Erebê Şemoyê Şamil her sal bi bîr were, û xelatek bi navê wî ji bo romana kurdî were damezrandin û dandin.

# Partîtî Zorê Li Zimên Jî Dike

**Vejîna Kurd**

Di bersivdayîna komendekê li ser helbesteke ku min li ser rûpela xwe ya fêsbokê weşandibû de, min ji hevalekî xwe re weha nivîsand: Spas hevalê hêja. Lê tiştê seyr ku ew mirova ji bêjeya heval tengijî û got: PYD dibêjin heval, ji ber wê jî tu çi dixwazî bi min re bêje lê mebêje heval! Tevlî ku ev ne cara yekê bû ku ez vê gotinê ji hin kesan dibihîsim, lê di cih de pirseke rûreş xwe li mejiyê min gerand û pêwîstî bi bersivdanê hebû.. Ma gelo partîtî zorê li zimên jî dike?!! Pir cihê mixabiniyê ye, ku îro nakokî û partîtî di xwîn û rihê me de diherikin, kînê di dilê me de diçînin, ew kîna destdirêjiyê li zimanê me yê resen jî dike û digihê astekê ku hin kesên xwediyên ........ 7



# Mêvanê Bêsoz ...

**Zozan Abdo**

Hincaran mêvanê ku jinişkava de tê, li ba dilê me ne biqebûl e. Lê belê ew ne wisa ye, ku tu çiqas lê bigerî, û ger dengê te ji gewriyê bikeve jî, ger wî nexwest ku were, qet ji cih nalive!. Ku ji nişkavan de, û bêyî soz di delîveyeke ne gengaz de, li ber deriyê dil dengê tiktikên wî tê bihîstin... mêvanekî ku tu nikarî deriyê xwe li pêş bigrî, ji xwe piştî demekê, tu têdighêjî ku ne tu bûyî yê derî vekiriye... Kilît di destên wî de bû?... Belê, ew evîn e, hezkirin e, ma gelo hezkirin ne bi jiyanê hestkirin e?!.. Hez...Zayîneke nû ye, buhareke di birûsk û bahozên zivistanê de geşbûyî ye, omîdeke



li dijî bêzariyê ye, û mûzîkeke bi xweşikbûna xwe, du dilan ji du canan, jêdike û mîna du perçekên sêvekê, di giyanekî pîroz de dike yek .

Hez... Hêzek e, dikare çemekê ne tenê biherikîne, lê di çiyayekî bilind re hilkişîne, jêr berve jor ve bibe. Hez...leşkereke xort e, ger ket canê welatiyekî dikare pê deşt û zozanan rizgar bike. Rêzikên mirov, hestên wî yên tevlîhevbûyî û rêwendabûyîna wî ya hundirîn, giş mîna teneyên hinareke sorengî di hezê de dicivin û mirov ji nû ve hînî jiyanê dike... Yek ji giranbuha rêzikên gerdûnê dibêjin, ku hez xwerina çivîka ye, şîlana kulîlka ye, û roka ezmên e. Ev jî, li gorî ez dibînim rast e, kesê ku van sê rêzikan baş tevde, wê bibîne ku hez li derdora me di her tiştekî de bêhn vedaye, lê divê em zanibin çawa pê re bidin û bistînin, ji xwe tenê divêt em dilpak bin, bihêlin ku giyana me di bin sîwana ezmên de sema bike, ji şîlana gulan vexwin û mîna rokê eşqdayî bin. Ango divêt em li zarokê hundir xwe de miqate bin, bila ew zarok, her zarok bimîne!. Gerdûn hez e, hez jî gerdûn e... Hez narîn e, welat e, dil e, buhar û zivistan e, ezman û zemîn e, hez her tişt e, lê ji bîr mekin ku yê hez dît...xwe dît.


**Partîtî .... Dûmahîk**

derûniyeke lawaz, ji bo şerê birakujiyê, xwe ji hin bêjeyên ku ji kaniya zimanê kurdî herikîne bişon, û zikreşiya xwe li derbarê wan xuya bikin. Belê.. Ziman ne henek û ne jî lîstik e ku birînên nakokiyên me di wê de vedin. Zimanê me him rûmeta me ye, hem jî resm, reng û dengê miletê me ye. Ew ne milk û mewalên min û te ye ku em bêjeyên wî li nav partiyan parve bikin û wî bi ber gezan din. Eger wisa bibe bêguman zimanê kurdî dê li ser hilm û pifê bimîne û di gola partîtiyê de bigevize. Divê em tev zanibin ku zimanê kurdî partiya me ya herî mezin û bi nirx e. Ji zû de dijmin û xêrnexwezên kurdan ew qedexe kirine û hîn jî hewil didin, ku wî bihelînin û ji holê rakin. Lewma zor pêwîst e ku ew ava ku aşê dijmin digerîne em rawestînin. Vêca çawa em kurd bi destên xwe wî dikin dîlê partî û nakokiyên xwe û bi hêsanî kirasê kurdayetiyê ji hin bêjeyên kurdî yên zelal û watedar dikin û wan şermeze dikin?!! Nakokî û lihevnekirin tucarî ezîtiya kufikî sar nakin, lê ew birînên me yên herî mezin dijenînin. Ew civakeke nexweş û piralî û herweha şerê birakujiyê peyda dikin û qet nakevin xizmeta doza me ya pîroz.. Zor pêwîst e ku em ji wan nexweşiyan rizgar bibin. Belê.. Banga me ew e, ku kurd zimanê xwe ji ber bayê partîtî û nakokiyên xwe bi alî din.

**LEYLA ... Dûmahîk**

wê demê de temenê wê heşt sal bûn, xwendekareke zîrek bû, pileya yekemîn di dibistana amadayî de wergirt bû. Pişt re derbasî zanîngeha Bexdadê -beşê civakî- bû. Di sala 1971ê de bi malbata xwe re ji Xaniqînê çû Bexdadê û li wir bi cih bû. Di sala 1974 an de bû endamek di yekîtiya jinên kurdistanê de ku bi ser Partiya Demokrat a Kurdistanê ve bû. Leyla bi zimanê kurdî, erebî û înglîzî daxivî. Di 29ê Nîsana 1974na de di demjimêr dudiyê êvarê de, leşkerên Îraqê êrîşî mala wê kirin, ew girtin û di sêzdehê Gulana 1974an de bi destên wan hate bidarve kirin. Wê hîngê temenê wê nebûbû 24 sal, û ew li goristana Necef El Eşref hat veşartin. Yekemîn jina kurd di dîroka kurdan û rojhilata navîn de hat bidarve kirin ji bo sedemên siyasî, Leyla bû . Herwiha jî Leyla bû helbesta helbestvanan, wêjeya wêjevanan û strana stranbêjan. Gelek helbestvanan li ser nivîsand wekî: Ferîd Ozon, Bedirxan Sindî, Elî Mûrad Mayxan û hwd. Jiyana Leyla û têkoşîna wê bû destana strana stranbêjên kurd wekî: Hemê Ciza, Elî Tico û hwd. Hezar dilovanî li giyanê têkoşera kurd LEYLA QASIM be.

# Xebatkarê Navdar Nûşêrwan Mistefa çû ser qedera xwe.



Piştî keftlefteke giran bi nexwaşiyê re, li roja 19ê Gulanê, xebatkarên bi navûdeng Nûşêrwan Mistefa serok û damezrênerê Tevgera Goran li Herêma Kurdistana Îraqê jiyana xwe ji dest da û kete nav rêza nemiran.

Xebatkarê navdar Nûşêrawan li sala 1944an li bajarê Silîmaniyê jidayîk bûye. Ji xortaniya xwe de derbas nava xebata netewî û refên Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê û Şoreşa kurdî bû bû. Nemir Nûşêrawan li zanîngeha Bexdadê beşê zanistên siyasî xwend û pişt re çû li welatê Nemsa bawernama Macistêr di zagona navdewletî de bi serkeftî bi dest xist. Piştî sala 1975an vegerî Kurdistanê û li gel Celal Talbanî û hevalên din Partiya Yekîtî Niştimanî Kurdistanî ava kirin û dîsa dest bi xebata çekdarî û şoreşê kirin.

Rêzdfar Nûşêrwan li sala 2006an ji Yekîtî Niştimanî Kurdistan veqetî, damezraweke ragihandinê ava kir û di riya wê re atvgera Goran peyda bû.

Bi boneya goçkirina xebatkarê nemir Nûşêrwan Mistefa, sekeretêrê Partiya Yekîtî Demokratî Kurd li Sûryê rêzdar Mihyedîn Şêx Alî ev birûska sersaxiyê ji hevalên Tevgera Goran hinart:

Birader endam û serkirdeya Tevgera Goran a rêheval…

Ji ber goçkirina biraderê me yê xebatkar Nûşêrwan Mistefa, em we hemiyan silav dikin û ji dil de serê we xweş dikin. Kek mistefa bê dudilê jiyana xwe ji bo bergiriya di ber doza gelê xwe ya rewa de boran dibû. Goçkirina wî ziyanek e ji gelê Herêma Kurdistana Îraqê û ji hemî kurdan re. em di riya we re, sersaxiya partiya me ji mal û malbata jidestçûyî, hem endam û dostên Tevgera Goran re rêdikin. Hêviya me ew e ku li ser şopa jidestçûyî Nûşêrwan Mistefa berdewam bikin, çinkî wekî ku me ew nas dikir, ew ji bo pêkahatina siberojeke xweştir ji bo gelê xwe û gelên herêmê navnîşan û dilxwaze bû.

# LEYLA QASIM KÎ YE ?

**Emel Etî**





Leyla Qasim Hesen Elî. Di sala 1950î de li gundê Batmîl yê girêdayî herêma xaniqînê ji dayîk bû ye. Ji êla Windê ye, bavê wê di kampaniya Kanê de karker bû, navê dayîka wê Ismet Mihemed Casim e, sê xwîşk û sê birayên wê hebûn. Leyla di sala 1958an de derbasî dibistana seretayî bû. Di ……❹

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de

Êmêla Newrozê: Newroz@yek-dem.com